

RAPORA GIRTÎGEHA ÎMRALIYÊ ya TEKÎLDARÊ ÇAVDERIYÊN ÎXLAL Û MAFAN ya 2016an

I. DESTPÊK

Di Tirkîyê de hewldana derbeyê ya 15ê Tîrmeha 2016an di rasteka hiqûqî-polîtîk-rêvebirinê de guherînên girîng pêk anî. Bi vê sedemê pêşveçûnên girêdayî salek (2016) ya Girtîgeha Girava Îmralityê û çavderiyên xwe yên tekîldarê îxlalan di navbera 1ê Çile 2016- 15ê Tîrmehê 2016an û 15ê Tîrmehê 2016- 31ê Berfanbarê 2016an bi du beşan pêşkeşî we dikin.

Muwekîl Birêz Abdullah Ocalan ji 15ê Sibata 1999an vir ve di Girtîgeha Girava Îmralityê de tê girtin û deh salên vê demê li girtîgehê tena serê xwe di hicreyeke yek kesî de tê girtin. Deh sal piştê hatiye tespîtîkirin ev merc ji qedexeya miameleya xirab û îşkenceyê re dijber e li ser vê yekê 17ê Mijdara 2009an de 5 girtî hatine neqilkirin. Xeynî Birêz Ocalan ev 5 muwêkîl di dîroka 15ê Adara 2015an de ji girtîgeha Tekîrdagê û Kandirayê re hatine neqilkirin. 5 girtîyên nû ku bi navê " Sekreteryâ" tên binavkirin ji çapemeniyê re jî hatiye gotin ji bo pêvajoya çareseriyê ye di 17ê Adara 2015an de ji Girtîgeha Girava Îmralityê re hatine neqilkirin. Encax ji wan girtîyên nû Birêz Nasrullah Kuran û Birêz Çetîn Arkaş di 26ê Berfanbara 2015an de bi şev derveyê daxwaza xwe ji Girtîgeha Girava Îmralityê hatine girtin û di 27ê Berfanbara 2015an de birine Girtîgeha Sîlvriyê bi hejmara 9 emîn ya di nav sînorên Stenbolê de ye. Ji vê nûçeya sirgûnê di 5ê Çileyê 2016an de bi tesedîfî agahdarî çêbûye. Ji 6ê Çileyê 2016an vir ve her roj ji dozgeriya Saziya Înfazê Girtîgeha Sîlvriyê û Gerîndehîya li wir re serîlêdanên hevdîtîna parêzeran hatiye kirin ligel wî 6 roj hevdîtîna pêk nehatiye. Hevdîtîna 11ê Çileyê 2016an jî di mercên dijhiqûqî de bi amûra qeyda deng û li ber erkdarek tenê 15 deqîqe pêk hatiye. Bi vê mînakê polîtîkayên tecrîda Îmralityê bi halekê şênber pêkanînên girtîgeha reş dest pê kiriye.

Piştî van pêşveçûnan di Girtîgeha Îmralityê de derveyî Birêz Ocalan, Birêz Omer Hayrî Konar, Birêz Weysî Aktaş û Birêz Hamîlî Yildirim jî hene. Hemû girtî di hicreyên yek kesî de û ji hev îzolekirî dimînin. Hewadarkirinên ku rojê 4 seat tên derxistin jî girêdayî hicreyê wan e û ji hev îzolekirî ye. (dema hewadarkirinê ji bo Ocalan rojê du saet pêk dihat û di 2016an de tekîldarê guherîna vê rewşê agahîyeke nû nehatiye girtin.) Girtî rojê saetekê di qadekê hevpar de (axaftin yan jî werzîşê) de tên li ber hev.

Pêkanînên girtîgehên din û derfeta ragihandina dinyaya derve û mafên din ji bo li Îmralityê pêk nayê agahiyên tekîldarê qada jiyana girtîyan û mercên tendûristiya wan de agahîyekê teqez nayê zanîn. Ev ; wekî mafê hevdîtîna bi malbatan re, xeynî malbatê hevdîtîna bi sê hevalên wan re û hevdîtîna bi telofênê re ye. Yê ku di Îmralityê de girtîne

di nava 2016an de qet nikaribûne hevdîtîna parêzeran pêk bînîn û qet hevdîtîna bi telefonê nekirine. Derveyê hevdîtîna Birêz Ocalan a ku bi birayê xwe re kiriye girtiyên din bi malbatên xwe nikaribûne hevdîtîna pêk bînin. Gava hemû van mercên neyînî tîn li ber hev, Girtîgeha Îmraliyê ji saziyeke li gorî hiqûqê, zelal û dikare were kontrolkirin derdikeve, hîlberîna rejîma Înfazê ya teşeya pergala tecrîdê ya Îmraliyê dike.

Di dîroka 18ê Adara 2014an de AÎHM biryara tekîldarê çar serîlêdanên bi hev ve yê Birêz Ocalan (hejmara serîlêdanê: 24069/03, 197/4, 6201/06 û 10464/07) diyarkir. Di vê biryarê de encama cezaya girantirîn a heta hetayê " heta bimire" tu pêşgiriya berdanê tune ye ev ceza îxlala qedexeya miamelaya xirab û îşkencê pêk tîne derketiye. Girtîtiya Birêz Ocalan a di van mercan de dikeve sala 18 emîn. Hikumeta Tirkiyê hîn jî rêgezêkê vê biryarê ku were nirxandin gavekî zagonî yan jî îdarî neavêtiye. Ev rewş di dîroka 16ê Hezîrana 2016an de ji Komîteya Wezaretên Şûraya Ewropayê re bi agihandinek hatiye ragihandin.

II. PÊŞVEÇÛN Û ÇAVDÊRIYÊN DI NAVBERA 1ê ÇÎLE û 15ê TÎRMEHÊ

Ji 27ê Tîrmeha 2011an vir ve di Îmraliyê de bi Birêz Ocalan re ligel sedan serîlêdanan hevdîtinekî parêzeran pêk nehatiye. Ji Çîleya 2016an heta 15ê Tîrmeha 2016an 57 serîlêdanên parêzeran yê ji bo hevdîtîna hemû jî bi sedemên cur bi cur ji hêla Serdozgeriya Komara Bûrsayê ve hatiye redkirin. Ev serîlêdan her hefte du caran ji bo rojên Çarşem û Înê hatine kirin. Ji serîlêdanan 47 heb bi binasiya "keştî xirab e" 10 heb jî bi binasiya " rewşa hewayê ne baş e" hatiye redkirin. Di nav heman dîrokê de endamên malbatan 26 caran bi daxwaza hevdîtîna serî li Serdozgeriya Komara Bûrsayê re dane. Encax hemû serîlêdan bi heman binasiyan hatine redkirin.

Di derheqê pêkanîna tecrîda Îmraliyê de Komîteya Pêşlêgirtina Îşkenceyê ya Ewropayê (ji vir pê ve ew ê wekî " CPT" were gotin) birêkûpêk hatiye agahdarkirin. Ji bilî hevdîtîna rû bi rû di nivê salê de,

-Di navbera Çîleya 2016an Tebax 2015- Çîle 2016an de encama serîlêdanên malbat û parêzeran ên ji bo hevdîtîna û tekîldarê rewşa heyî ya muwekîlên me agahdariya bi giştî hatiye kirin

-Di meha Nîsanê de di navbera Çîle 2016 û Nîsan 2016an de di derheqê encamên serîlêdanên parêzer û malbatan de agahî hatiye dayîn û ji CPTyê tekîldarê Tecrîda Îmraliyê de daxwaza gavên hewce were avêtin hatiye kirin.

Piştî van pêşveçûnan CPT di 28-29ê Nîsana 2016an de pêkanîna hevdîtîna xwe ya Girtîgeha Girava Îmraliyê di malpera xwe ya fermî ya înteretê de daye xuyakirin. Tekîldarê vê hevdîtîna rapora CPTyê hîn jî bi rayagîştî re nehatiye parvekirin.

Ne gengaz e em bibêjin hewldanên CPTyê li ser tecrîda Îmralityê bandora ku hewce dike nişan daye. Di Hezîrana 2016an de tekîldarê bi mercên tecrîdê re ji Berdevka Pêşilêgirtina Îşkenceyê ya Koma Mîletan re serîlêdan hatiye kirin. Di vê serîlêdanê de hîn pêşveçûnek pêk nehatiye.

III. **ÇAVDÊRÎ Û PÊŞVEÇÛNÊN DI NAVBERA 15Ê TÎRMEHÊ Û 31Ê BERFANBARA 2016an**

Di 15ê Tîrmeha 2016an de li Tirkîyê hewldana derbeya leşkerî hatiye dayîn. Piştî hewldana derbeyê ji 21ê Tîrmeha 2016an vir ve bi tevahiya welat de eşkerekirina OHALê hatiye diyarkirin. Piştî OHALê di Tirkîyê de Biryarnameya di Hikmê 12 Qanûnê de (KHK) hatiye weşandin, di 22ê Tîrmeha 2016an de di Rojnemeya Fermî de bi biryarnemaya OHALê ya ewil di mafê hevdîtina girtîyan a hevdîtina parêzeran de sînordarkirinên micid anîye, pêkanînen kêfî û bêhiqûq yên 18 sal in li Girtîgeha Îmralityê pêk tê bi aliyekî ve di tevahiya welat de belav bûye. Beriya biryarnemaya OHALê derkeve "biryara sînordarkirina" ewil di girtîgeha Îmralityê de pêk hatiye.

Di biryara hejmara kar 2016/56 D. ya 1 emîn Dadgeriya Înfazê ya Bûrsayê de bi dîroka 21ê Tîrmeha 2016an , ji dîroka biryarê vir ve cezaxwarên li girava Îmralityê;

- Qedexeya hevdîtinê,
- Sînordarkirina hevdîtinên telefonê û ragihandinên bi niviskî
- Sînordarkirina tekiliyên derve, qebûlkirina serdêran, û hevdîtinên telefonê,
- Biryara sînordarkirina belgeyan a parêzerên cezaxwaran bidin hatiye dayîn.

Ev biryara ku ji hêla me ve li ser îtîraz hatiye kirin palpişta wê ya hiqûqî tune ye û pêkanîna wê mijara vegotinê nîn e. Rêgezên ku bûne palpişta biryarê rêgezên 114emîn û 115emîn a Qanûna Înfazê ya bi hejmara 5275 ji bo girtîyan e û cezaxwaran nahundirîne nekarîbûna astengkirina hevdîtina parêzer û muwekîlan jî digire bine temînatê. Îtîraza ku ji bo biryarê hatiye kirin bi biryara Dadgeha Cezaya Giran a 2emîn a Bûrsayê bi dîroka 26.07.2016 û bi hejmara kar ya 2016/1127 D. hatiye redkirin. Di dîroka 27.10.2016 li hemberê van pêkanînan û biryaran ji Dadgeha Makeqanûnê (AYM) re serîlêdana takekes hatiye kirin. "daxwaza pêşgiriye" ya serîlêdanê ji hêla AYM ê ve hatiye redkirin. Encax Dadgeha Makeqanûnê tekîldarê bingehe hîn biryareke nedaye.

Piştî hewldana derbeyê de nûçeyên çapemeniyê bi vê şiklê " planên derbesazan yên Îmralityê" diltirsiya ewlehiya muwekîlan zêdetir kiriye. Nûçeyên ku li çapemeniyê derketin " di êvara 15ê Tîrmehê de ew ê girava Îmralityê were bombekirin" dîsa " Ew ê Ocalan were revandin" hatiye diyarkirin. Kesên ku hewl dan derbeyê pêk binîn revandinda muwekîlê me û divêtiya plana tunekirinê di medyayê de zêdetir cih girt. Li ser van pêşveçûnan serîlêdanên parêzeran yên her roj pêk dihat heta 21ê Tîrmehê bê

bersiv hat hiştin, ji vê dîrokê vir ve 1 emîn Dadgeriya Înfazê ya Bûrsayê biryarê li jor wekî binasî nîşan daye û red kiriye. Biryar di derheqê ragihandina bi nivîskî, telefon û qedexeya serdêran de bû û ji bo qedexekirina hevdîtina parêzeran hikmek tune bû dîsa ev yek wekî binasî tê nîşandan. Di tu hikmekî KHKya ku ji 21ê Tîrmeha 2016an vir ve hatiye weşandin de îbareyek tekîldarê girtiyek bi temamî nikare bi parêzerê xwe re hevdîtin bike tune ye.

Di derheqê pêşveçûnên ku diltirsî pêktînin de ji bo agahdariyê di Tirkîyê de bi gelek rêxistinên maf û civaka sîvîl re hevdîtin hatiye kirin û serîlêdanan pêk hatine. Dîsa serîlêdanên di 19ê Tîrmehê û 26ê Tîrmeha 2016an de cuda cuda ji CPTyê re hatiye kirin de daxwaza bi lezgînî serdana Girtîgeha Îmralityê hatiye kirin. CPT, di navbera 29ê Tebaxê- 6 Îlona 2016an de ji Tirkîyê re serdanek pêkanîye. CPT neçûye Îmralityê, piştî serdanê di daxuyaniya çapemeniyê ku hatiye weşandin de daye xuyakirin rewşa Îmralityê bi kesên erkdar re hatiye axaftin.

Ev pêşveçûn heta ji Birêz Ocalan agahiyeke baş hate girtin bû sedema 50 sîyasetmedarên Kurd bikevin greva birçîbûnê ya bê dem û bê dorveger. Grewa birçîbûnê ku di 5ê Îlona 2016an de dest pê kir 11ê Îlona 2016an de dawîya hefteyê piştî Mehmet Ocalan bi kekê xwe yê ku di Girava Îmralityê de bi Birêz Ocalan re saeteke hevdîtin kiriye û gotiye rewşa tenduristiya wî baş e hatiye dawîkirin. Ji 6ê Cotmeha 2014an vir ve hevdîtina malbatan ku li Îmralityê cara yekemîn pêk hat tenê Birêz Ocalan karibû pêk bîne û di nava 2016an de di Îmralityê de tenê ev hevdîtin çêbû. Birêz Mehmet Ocalan piştî vê hevdîtinê diyar kiriye qasî ku çavdêrî kiriye rewşa wî ne xirab e û şeva 15ê Tîrmehê ji şexsê wî re midaxeleyek pêk nehatiye. Piştî vê hevdîtinê hemû serîlêdanên ji bo hevdîtinê ji nû ve hatiye redkirin; Îmralityê heta dawîya 2016an carekê din ji bédengiya tecrîdê re hatiye hiştin.

CPT, di 6ê Berfanbara 2016an de di navbera 19ê Tîrmeha 2016-25ê Mijdara 2016an de di derheqê serîlêdanên û encamên parêzeran û malbatan de ji nû ve hatiye agahdarkirin. Di navbera 15 Tîrmehê-31 Berfanbara 2016an de 62 serîlêdanên parêzeran ji bo hevdîtinê hatiye kirin. Dîsa di heman dîrok de 54 serîlêdanên malbatan ji bo hevdîtinê hatiye kirin. Ji bilî bi dîroka 11ê Îlona 2016an ku hevdîtina malbatê, tevahiya serîlêdanan bi binasiya biryara 1 emîn Dadgeriya Înfazê ya Bûrsayê “ di dema rewşa awarte de nehîştina hevdîtinê” hatiye nîşandan û hatiye redkirin.

IV. ENCAM

Di nav sînoren Tirkîyê de, Saziya Înfaza Cezaya Ewlehiya Bilind a Tîpa F ya Îmralityê yê ku li Girava Îmralityê de ye bi pergaleke dij mafê bingehîn û azadiyê, dij nirxên demokrasiye û merc û rêgezên gerdûnî, tê îdare kirin. bi KHKyan ji 2005an vir ve dij hiqûqî tenê hinek sînordariya mafên parastinê re bi anîna “ zagonî” pêşiya belavbûna girtigehên din vekiriye. Ev ; qedexeya parêzertiya girtî û cezaxwar, sînordarkirina dem û rojên hevdîtina parêzeran a bi girtiyan re, di

hevdîtina parêzeran û girtiyên de tevlihbûna erkdarê ji Hikûmetê, dest danîna li ser belgeyên parêzeran, pêkanîna wekî di hevdîtina parêzer û muwekîlan de qeydkirina deng û dîmena hevdîtîna ye. Palpiştîna zagoniya beşeke mezinê vê pêkanîna tune ye (wekî sînoordarkirina dem û rojên hevdîtîna û qeyd girtina hevdîtînan) li Îmraliyê di hemû hevdîtînan parêzeran yê navbera Hezîrana 2005- 27ê Tîrmeha 2011an de pêk dihatin. Ji Tîrmeha 2016an vir ve bi sedema OHALê ev pêkanîna bi KHKê bû zagonî, pêkanîna berê di Îmraliyê de pêk dihatin di nav Hiqûqa asayî de tê wateya dij zagonî bû, ev dide nîşandan Îmrali her tim di statatûya OHALê de bû zagonî de bûye.

Di nav rêjimeke asayî ya hiqûqî de Îmrali wekî ciheke derasayî dihat girtin di navbera 2013-2015an de bûbû cihê ku hevdîtîna pêvajoya çareseriyê ya zagonî û fermî dihat meşandin û Birêz Ocalan bûbû aktore bingehîn ê vê pêvajoyê. Ev hevdîtîna, bûbû sedema pevçûnê were sekinandin, pirsîgîrê bi nîqaşên politik werin kirin, û bibe avakirina zemîneke sosyo- polîtîk . Ev hemû tiştê cuda cuda bûne pêwistiyên Tirkiya 2016an. Pêvajoya qûtîkirina hevdîtîna Îmraliyê yê ji Nîsana 2015an vir ve cihê xwe ji Tîrmeha 2015an vir ve ji pêvajoya pevçûnê ya bêhejm û bêmerc re hiştîye. Ji vê dîrokê vir ve diyalog, nîqaşên polîtîk, pirdengî, daneyên wekî parastina mafan bi antîtezan hilweşîya. Şer, heqeret, serkûtkirin, tenê hiştin, qutifandin...

Di bin van mercan de di nava salekê de hevdîtîneke me bi muwekîlê xwe re pêk anî di vê hevdîtîna de peyama wî wisa di çapemeniyê de hat belavkirin ‘’ vê pêvajoyê me xirab nekir. Bi min re ji bo aşîtiyê hevdîtîna pêk were. Heke daxwazê wisa hebe, bi projeyên xwe yê aşîtiyê em dikarin di nav çend mehan de pirsîgîrê çareser bikin. Pêvajoyên hevpeyvînên berê yê civaka Tirkîyê re şewq daye, rista çareseriyê ku di vê pêvajoyê de Îmrali girtiye ser xwe, paraleliya tecrîbê û pevçûnê nîşan dide ku Îmraliyê di bîdengîya tecrîbê de hiştin, hilbijartina Tirkiyê ya jiyana demokratîk û aşîtxwaz her roja ku diçe lawaztir dike.